# RÛHÎ: HELBESTVANEKÎ DAHÊNER Ê SERDEMA PIŞTÎ MÎREKTIYAN Û BANDORA WÎ

**Abdurrahman Adak***

Şêx Ebdurrehmanê Rûhî helbestvanekî girîng û dahêner ê serdema piştî mîrektiyan e. Çi di tema û mijaran de, çi di şêwazên edebî û hunera helbestê de be ferq nake ew di edebiyata kurdî ya klasîk de xwediyê gelek dahênanên edebî ye û gelek peyrew li pey xwe hiştine. Bi rehetî dikare bê gotin ku di serdema piştî mîrektiyan de li Bakur helbestvanekî dî yê bi qasî wî orjînal û xwedî bandor tuneye. Şêx Ebdurrehmanê Rûhî bi van taybetiyên xwe ne ji bo serdema piştî mîrektiyan tenê, ji bo tevahiya tarîxa edebiyata kurdî wek helbestvanekî girîng derdikeve pêş.

Bêguman Rûhî helbestvanekî klasîk e ku di nav kevneşopiya edebiyata klasîk a berî xwe de maye, lêbelê digel vê kariye rengekî nû bide edebiyata kurdî. Çawa ku her yek ji Melayê Cizîrî, Feqî, Xanî û yên dî di tarîxa edebiyata kurdî de hin tiştên nû afirandine, Rûhî jî wek wan tiştine nû afirandine. Çawa ku dîwana Mela û Mem û Zîna Xanî, yan jî mewlûda Bateyî di qadên xwe de berhemên orjînal in, Rewdu'n-Ne'îma Rûhî jî di qada xwe de berhemeke orjînal e. Bi rehetî dikare bê gotin eger ev berhemên navborî yên Mela, Xanî û Bateyî ketibin nav klasîkên kurdî, Rewdu'n-Ne'îma Rûhî jî klasîkeke kurdî ye. Bêguman ji vî aliyî

* Doç. Dr., Zanîngeha Mardin Artuklu

ve Rewdu'n-Ne'îm, dahênanek e ji bo serdema piştî mîrektiyan. Belkî taybetiya her girîng a vê berhmê jî ew e ku di serdema piştî mîrektiyan de ye, yanî di qonaxeke dawî ya tarîxa edebiyata kurdî de ye. Rewdu'n-Ne'îm klasîka her dawî ya edebiyata Kurmancî ye. Bêguman Rûhî ne Rewdu'n-Ne'îm tenê nivîsiye. Loma dahênanên edebî yên Rûhî jî ne bi Rewdu'n-Ne'îmê tenê ve girêdayî ye. Di çarçoveya dîwana wî de jî gelek dahênanê wî hene.

Di vê gotarê de armanca me ew e ku em van dahênanên edebî yên Rûhî tesbît bikin û di çarçoveya wan de bandora wî ya li ser helbestvanên pey wî destnîşan bikin. Lêbelê berî vê divê em atmosfera ku Şêx Ebdurrehmanê Rûhî derxistiye meydanê û wek xwediyê van dahênan Şêx Ebdurrehmanê Rûhî  nas bikin.

### 1. Malbat û Ekola Aqtepeyê

Aqtepe gundekî Çinara Diyarbekirê ye ku di serdema piştî mîrektiyan a tarixa edebiyata Kurdî de ji bo edebiyata kurdî bûye navendeke gelekî girîng. Xweseriya vê navendê ew e ku helbestvanên ku ji wê derê derketine ji heman malbatê ne û van helbestvanan di tarîxa edebiyata kurdî de ekoleke edebî saz kirine. Wek taybetiyeke karakterîstîk a serdema piştî mîrektiyan paşxana navend û ekola edebî ya Aqtepeyê jî medrese û tekyayên Xalidîtiyê ne. Lewra wek gelek deverên dî yê Kurdistana wê demê li Aqtepeyê jî medreseyeke Xalidîtiyê ava bûye ku di heman demê de wek şaxeke tesewufî ya Xalidîtiê jî kar kiriye. Ev medrese û tekya ji aliyê pêşiyê malbata Aqtepiyan Şêx Hesenê Nûranî (k.d. 1863) ve hatiye damezirandin. Malbata Şêx Hesen bi eslê xwe ji herêma Hekariyê ye û ji wê derê koçî Hawêl (Baykan) kiriye.[1] Şêx Hesenê Nûranî li Hawêl hatiye dinyayê û di Kurdistana wê rojê de perwerdeya xwe dîtiye. Di qonaxa perwerdeya wî de kesayetê ku her zêde balê dikişîne bêguman seyda û şêxê wî Şêx Salihê Sîpkî (k.d.1852) ye ku ev kes di wê serdemê de yek ji nûnerên her girîng ê Xalidîtiyê ye. Piştî ku Nûranî perwerdeya xwe xilas kiriye, li ser daxwaza şêxê wî yê navborî , ji aliyê Siltan Ebdulmecîdê Osmanî ve bi mebesta ku medreseyekê ji xwe re ava bike li gundê Aqtepeyê 52 parsel erd jê re hatiye hîbekirin (derdora 1850yi). Şêx Hesenê Nûranî bi vî awayî li Aqtepeyê bi cih bûye û li wê derê medreseya xwe ava kiriye. Ji wê rojê şûn de gundê Aqtepeyê hem ji aliyê çalakiyên ilmî (medrese), hem jî ji aliyê çalakiyên tesewufî (tekya) ve bûye navendeke girîng û

1 M.Şefik Korkusuz, *Tezkire-i Meşayih-i Amid*, c.I-II, Kent Yayınları, İstanbul, 2004, r. 250-251.

medrese û tekyayê wê derê di dawiya Osmaniyan de serdemeke zêrîn derbas kiriye. Medrese û tekyaya Aqtepê ji damezirandina xwe heta bi bûyera Şêx Seîdê Palo (1925) bi awayekî aktîf li ser piyan maye. Divê bê gotin ku bingeha hemûyan a hevpar a van helbestvanan medrese û tekyaya Aqtepê ye. Vê medrese û tekyayê rengê xwe daye hemûyan. Piştî têkçûna bûyera Şêx Se'îd endamên malbata Aqtepiyan ji bêgavî belawela bûne û medrese û tekya jî hatine girtin.

Eger em li edîbên Aqtepeyê binêrin tabloyeke weha dê derkeve pêşberî me: Şêx Evdirehman û Şêx Mihemed Can (kurên Şêx Hesenê Nûranî), Şêx Kerbelayî û Şêx Eskerî (kurên Şêx Evdirehman) û Şêx Hesîb (Şêx Mihemed Can) berhemên gelekî girîng diyariyî edebiyata kurdî kirine. Ev yek di şemaya jorîn de dikare bê şopandin:

Tişta ku divê bê tesbîtkirin ev e ku medrese û tekyaya Aqtepê ji bo edebiyata kurdî bûye navendeke edebî û ji vê navenda edebî jî ekoleke edebî derketiye meydanê. Hemû helbestvanên ku ji vê navendê derketine girîng in û ji bo edebiyata kurdî ya klasîk nirxên mezin in. Çend taybetiyên girîng ên vê ekolê ev in: 1. Hesjêkirina malbata Cenabê Pêxember (muhebbeta Ehlê Beytê) 2. Hizra Kurdî 3. Hizra Neqşebendîtiyê. Ev xal di tevahiya helbestvanên Rûhî de tên dîtin. Loma wek riknên bingehîn ên vê ekolê ne.

## 2. Rûhî

Damizirînerê ekola Aqtepeyê Rûhî di sala 1853yan de li Aqtepeyê hatiye dinyayê. Di berhema xwe ya bi navê Rewdu'n-Ne'îmê de wî weha behsa nasnameya xwe kiriye:

Evî Ebdurrehmanê zarê melûl
Leqeb Şemsedînê zelûm û cehûl

Cigermurte'ib "Rûhi"yê Şafi'î
Evî rûsiyahê weten Aqtepî

Li ser î'tîqada Îmam Eş'erî
Terîqet bizan "Neqşiyê Xalidî"

Çawa ku ji beytên wî yên jorîn jî tê fêmkirin navê helbestvan Ebdurehman, leqeba wî Şemsedîn, mexlesa wî ya helbestê Rûhî, gundê wî Aqtepê, mezhebê wî yê fiqhî Şafi'î, mezhebê wî yê î'tiqadî Eş'erî û terîqeta wî ya tesewifî jî Neqşiya Xalidî ye.

Rûhî kurê mezin ê Şêx Hesenê Nûranî ye. Piştî ku bavê wî di sala 1863yan de koçî dawiyê kiriye, rêveberiya medrese û tekyaya Aqtepê ketiye destê Şêx Ebdurehman. Lêbelê ji ber ku wî zêdetir girîngî bi ilmê û perwerdeya medreseyê dida, rêvebirî û postnişîniya tekyayê ji birayê xwe yê biçûk Şêx Mihemed Can re hiştiye û wî bixwe zemanê xwe ji bo ilm û edebiyatê terxan kiriye. Şêx Ebdurehman, di sala 1907an de li Diyarbekirê koçî dawiyê kiriye û li gundê Aqtepeyê li cem gora bavê xwe hatiye veşartin. Şêx Evdirehman çar caran zewiciye û bi navên Mihemed Şewket, Mihemed Kerbelayî û Mihemed Eskerî sê kurên wî û bi navên Ruqiye, Şaxînebat û Pîrozxanê jî sê keçên wî çêbûne.[2]

### 3. Alıyê Edebî Yê Rûhî û Dahênanên Wî

Rûhî bi kurdiya kurmancî du berhemên girîng dane: Rewdu'n Neîm û Dîwan. Rûhî Rewdu'n Neîm di sala 1884an de nivîsiye, helbestên xwe yên dîwanê jî di demên curbicur de nivîsîne. Rûhî di çarçoveya van berhemên xwe de gelek tema, mijar, cure, huner û şêwazên nû dahênane. Girîngiya Rûhî dî tarîxa edebiyata Kurdî de ne dahênerî tenê ne. Di heman demê de wî di çarçoveya hin ji van dahênanan de bandoreke edebî jî li pey xwe hiştiye. Di tema, mijar û cureyan de hin dahênanên Rûhî yên ku bandor li pey xwe hiştine ev in: Mi'rac, şemail, Kurdîtî, Neqşebendîtî, ehlê beyt, xwarin, muxennîname. Di şêwaz û hunera helbestê de jî hin dahênanên Rûhî yên ku bandor li pey xwe hiştine ev in: ev in: Qelem, tekrîr, navê berhemê. Nîşaneyeke dî ya bandora Rûhî jî hin medhiye, teqrîz û nezîre ne ku li ser helbestên wî hatine nivîsîn.

### 4. Bandora Rûhî

Rûhî wek helbestvanekî dahêner bandor li gelek helbestvanên pey xwe kiriye. Ji van helbestvanan hin ji malbata wîn, hin jî ne ji malbata wî ne. Yên ji malbata wî ev in: Şêx Mihemed Can (k.d.1909), Şêx Mihemed Kerbelayî (k.d.1939), Şex Mihmed Eskerî (k.d.1952), Şêx Hesîb: (k.d.1947). Yên ne ji malbata wî jî ev in: Şêx Muhyedînê Hênî (1900) Mela Nesredînê Zoqî (1935) Mela Mihemed Nûrî Ewhedî

[2] Murat Özaydın, *Şeyh Abdurrahman Aktepe: Hayatı, Eserleri ve Görüşleri*, Cihan Yayınları, İstanbul 2009.

(1977) Mela Yasîn Yusrî (1994) Mela Eliyê Baqustanî (2002) Xemkûrê Xursî (berheyat e)

Bêguman bandora Rûhî li ser van helbestvan ne di heman pileyê de ye. Li jêrê em dê di çarçoveya tema, mijar, cure, huner û şêwazên nû de li ser bandora Rûhî rawestin.

## Bandora Rûhî di Tema û Mijaran de

### Mi’rac

Di edebiyata klasîk de ji wan berhemên ku derheqê mi’raca Cenabê Pêxembe de tên nivîsîn re jî “mi’raciye” tê gotin. Herçiqas di tarîxa edebiyata kurdî ya klasîk de berî Rûhî hin mi’raciye hatibin nivîsîn jî (wek Melayê Bateyî û Mela Xelîlê Sêrtî), mi’raciyenûsê her girîng Rûhî ye. Lewra kesê ku cara pêşî bi awayekî berfireh li ser mi’racê rawestiyaye û ji bo berhemek terxan kiriye ew e. Wî berhema xwe ya bi navê Rewdu’n Neîmê ji bo mijarên hilye-şemail û mi’raciyeyê terxan kiriye û di beşa duyem a berhema xwe de ku ji 13 bendan pêk tê ser mi’raca Cenabê Pêxember rawestiyaye. Di vir de ji destpêka mi’racê heta bi agahdarikirina xelkê di warê çûna mi’racê li ser hemû qonaxên mi’acê hatiye rawestan.

Rûhî di temaya mi’racê de bandor li Mela Mihemed Nûrî Ewhedî (k.d. 1977) kiriye. Ewhedî jî bi navê el-Menzûmetu’l-Mi’raciyye mi’raciyeyek nivîsandiye. Bi qeneeta me terxankirina berhemeke serbixwe di bandora Rûhî de çê bûye û Ewhedî di vê xalê de Rûhî şopandiye.

### Şemail

Di edebiyata klasîk de ji wan berhemên ku derheqê bedena Cenabê Pêxember û rabûn û rûniştina wî de tên nivîsîn re “Şemail” tê gotin. Rûhî nîvê berhema xwe ya bi navê Rewdu’n Neîmê ji bo vê temayê terxan kiriye. Wek temaya mi’racê, temaya şemailê jî berî Rûhî zêde neketibû nav metnên edebî yên kurdî. Herçiqas kesên wek Şêx Ehmedê û Mela Xelîlê Sêrtî di vê temayê de hin nimûne dabin jî, kesê ku di vê temayê de cara pêşî berhemeke serbixwe day Rûhî ye. Çawa ku di mijara mi’racê de jî hat gotin mijara sereke a Rewdu’n Neîma Rûhî Cenabê Pêxember e. Lêbelê ew di nav xwe de dibe du beş. Beşa yekem derheqê şemaila Cenabê Pêxember de ye û beşa duyem jî derheqê mi’raca wî de ye. Beşa şemailê jî ji 15 bendan (binbeşan) pêk hatiye. Di

vî warî de cara pêşî berhemek serbixwe ji aliyê wî ve hatiye nivîsîn ku ew jî Rewdu'n Neîm e.

Piştî Rûhî kesên wek Mela Nûrullahê Kodişkî, Mela Nesredînê Zoqî, Mela Sîracê Xelîlî û Mela Ehmedê Heyderî di mijara Şemailê de nivîsîne. Ji van nivîskaran ên ku bandora Rûhî aşkera li ser wan xuya dike Mela Nesredînê Zoqî ye. Lewra Zoqî di nav metnê xwe de bi taybetî cih daye navê Aqtepî:

Me pênc beyti tehrîfi kir j' **Aqtepî**

Ji bo yumna wî ku di nezmi bibî

..

Ji eãlê èEreb ew ji Haşim nesil

Bir û qews û ãor û spî bû şekil

Ew e ê enî rast û çav reş-belek

Bi cismê şefaf e tê óeyrîn gelek

Di wî dar û dîwar xuya ne yeqîn

Ji ewladê Adem hemî çêtir in

Bi şev her wekî roj di paş her wekî

Di pêşî xwe dîtî tu inkâr nekî

Di teótê da rêça wî teéâîr dikir

Di qûmê di axê xuya qeù nekir

Siya wî li erêê ne dîtin tu câr

Ne bewl û ne àaéiù ji wî pakidar

Mela Nûrullahê Godişkî di warê şemailê de berhemeke serbixwe nivîsiye ku navê wê el-Hemail fi'ş-Şemail e. Bi qeneeta me terxankirina

berhemeke serbixwe di bandora Rûhî de çê bûye û Godişkî di vê xalê de Rûhî şopandiye. Lewra Godişkî piştî Rûhî ye û bi ihtîmaleke biqewet wî Rewdu'n Neîma Rûhî xwendiye û ew wek model girtiye. Bêguman ji bo encameke teqez û pêwist e metnên her du berheman bên berawirdkirin.

**Kurdîtî**

Kurdîtî, yan jî bi awayekî vekirî hizra neteweyî ya kurdî prensîbeke girîng a hizra Rûhî ye. Ew bixwe di vê hizrê de aşkera di bin bandora Ehmedê Xanî de maye. Lêbelê dîsa aşkera ye ku wî jî bandor li helbestvanên malbata xwe kiriye. Ji ber ku helbestvanên malbata wî Rûhî bi awayekî yekpareyî di gelek mijaran de şopandine, ew di hizra kurdî de jî di bin bandora wî de ne. Li jêrê li ser hizrên Aqtepi di warê Kurdîtiyê de çend beytên nimûne cih digirin:

Ji Kurmanciyê zêde şîrîn niye

Welîkîn xerîdarê çendîn niye

Ku da Tirk û Faris nebêjin tu car

Nebûn Kurd ê nîşanê ʻişqa xedar

Welîkîn teʻessub nemaye li me

Ji vê Turk û Faris cimaye li me

(Şêx Ebdurehmanê Aqtepî, Rewdu'n-Ne'îm)

Çawa ku li jorê jî hat gotin Rûhî di mijara kurdîtiyê de herî zêde bandor li helbestvanên malbata xwe kiriye ku ew jî ev in: Xakî, Kerbelaî, Eskerî û Hesbî kiriye. Li jêrê ji helbestên her yekî ji wan çend beytên nimûne cih digirin:

Tirkî hene nîne kurdewarî

Kurdî wekî kenzeke veşarî

Peyda bikira ger me emîrek
Sahibhuner û xwedanê şîrek

Ev turk û ereb tetar û faris
Carek bibûna li ber me naqis

Emma ku xwedan ji bo me nîne
Nêv Rûm û Ereb ne ademî ne

Her mêrê di wan de ejdiya ye
Nêv Rûm û Ereb wekî çiya ye
(Şêx Mihemed Can, Leyla û Mecnûn)

Me her wek Newbihara Şêxê Xanî
Esasê wê ji bo etfala danî
(Mihemed Kerbelayî, Mirsadu'l-Etfal)

Gelek şêrîn e ev ezmanê Kurda
Derîxa me ji dest yekcarî berda
(Şêx Eskerî Iqdê Durfam)

El-Heq gelek şîrîneda ye
Kurmancî ye zêdetir seza ye
(Şêx Eskerî, Medhiyeya Leyla û Mecnûnê)

**Ehlê Beyt**

Temaya ehlê beytê yek ji dahênanên her girîng ê Rûhî ye ku bexşî edebiyata Kurdî ya klasîk kiriye. Bi taybetî di tarîxa edebiyata Kurdiya Kurmancî de berî Rûhî li ser vê mijarê zêde nehatiye rawestan. Bi

rehetî dikare bê gotin ku kesê ku cara pêşî ev tema xistiye edebiyata Kurmancî Rûhî ye. Rûhî girîngiyeke mezin bi ehlê beyta Cenabê Pêxember nîşan daye. Loma navên herdu kurên xwe Kerbela û Eskerî, di çarçoveya çanda ehlê beytê de danîne. Lewra Kerbela, bûyera Kerbelayê û Eskerî jî motîfa duwazdeh îmaman îfade dike. Herweha Rûhî di tarîxa edebiyata Kurdiya Kurmancî de cara yekem li ser Îmam Huseyn ku di bûyera Kerbelayê de hatiye şehîdkirin mersiyeyek û li ser Yezîdê ku Îmam Huseyn kuştiye jî lenetnameyek nivîsiye.

Bi qeneeta me ev derba bihêz a li ser motîfên Elewîtiyê bi du faktoran dikare bê îzahkirin. Ya yekem aliyê wan ê tesewifî ye. Lewra di tradîsyona Sunniyan de, xeta Elewîtiyê ji aliyê mutesewifan ve tê temsîlkirin. Ya duyem jî bandora Ehmedê Xanî ye. Lewra Xanî, di Nûbihara Biçûkan de li kêleka navên çar xelîfeyan cih daye navên 12 îmaman jî û xwestiye ku zarokên kurdan fêrî van navan bibin. Çawa ku Xanî di hizra neteweyî de bandor li endamên Ekola Aqtepeyê kiriye, bi heman rengî di vê mijarê de jî bandor li wan kiriye.

Li jêrê ji helbestên Rûhî yên bi vê mijarê re têkildar çend beytên nimûne hatine dayîn:

**Ji Mersiyeya Hesen û Huseyn a Şêx Ebdurehman**

Di sehrayê kerb û bela Şeh Huseyn

Dehen xuşk û lebteşne bû Şeh Huseyn

Hewar e werin ma'temê bî't-temam

Ji bo mersiya Şeh bikin îhtîram

Muherrem dema taze bêtin hîlal

Cedîden bikin ma'temê pur delal

Çu 'aşûra bêtin di mahê hezîn

Dikin heft tebeq erd û esman enîn

Huseyna  Huseyna Şehê Kerbela

Bi ‘eşqa te, xayet ez im mubtela

Çi agir kete cergê min pir şedîd

Huseyn û  Hesen herdu bûne şehîd

Ji destê me naê bikim xizmetê

Welê ser Yezîdî dikim le‘netê

**Ji Recmiye/Lenetnameya Şêx Ebdurehman**
Sed hezar le’net muzaef şubhê baranê şedîd

Her zeman la yenqeti’ bin ew li ser Rûhê Yezîd

Rûhiya wirdê zeban bêje hemî şam û seher

Le’netullahî ela rûhi’l Yezîdî fi’l-mezîd

**Ji Medhiyeya Îmam ‘Elî ya Şêx Ebdurehman**
Ya Eliyya ya Eliyya ya Eliyya ya Elî

Şod zi tîxî ab(i)dared rûyê ‘alem muncelî

Geştî goştî serteser ez wesfê paket mumtelî

La feta îlla Elî la seyfe îlla zulfîqar

Rûhî di temaya ehlê beytê de jî zêdetir bandor li helbestvanên malbata xwe kiriye ku ew jî ev in: Xakî, Kerbelaî, Eskerî, Hesbî. Lêbelê Rûhî di vî warî de bandor li helbestvanekî derî malbatê jî kiriye ku ew jî Mela Mihemed Nûrî Ewhedî ye.

Li jêrê ji helbestên helbestvanên malbata Aqtepiyan ên di vî warî dê çend nimûne dê bên pêşkêşkirîn:

**Ji Mersiyeya bi redîfa “Xakê Kerbela” ya Şêx Kerbela**
Der muherem her sene dar û ber û ax û nebat

Xwûn dibarînin ev e nîşanê xakê Kerbela

Sed hezar l'enet dibêjin ser Yezîd û tabi'an

Behrê wan mezlûmê meqtûlanê xakê Kerbela

**Ji Medhiyeya 'Eliyyê Esxer a Şêx Kerbela**
Tûleê gerden bi zencîrê 'Eliyyê Esxer im

Lew li ser emsal û aeqranan reîs û serwer im

Tewq(i) der gerden serê zencîrê der destê te bit

Rû bi xakê pakê Meşhed ser li ber pê ez werim

Ger bi şefqet çav bidî tolê xwe ey mewlayê min

'Ebdê alê Mustafa ez Kerbelaî Qember im

**Ji Medhiyeya 'Eliyyê Esxer ya Şêx Eskerî**
Tûleê gerden bi zencîrê Eliyyê Esker im

Ustuxwanxwarê derê cûd û sexayê rehber im

Ew Yezîdê kafirê mel'ûnê metrûdê le'în

Sed hezar le'net li wî hem wan hevalê bêşerim

**Ji Şefaetnameya Şêx 'Eskerî**
Ez im kelbê şehzadeganê nebî

Ku bû darê rehmet ji wan meywebar

Ku ya Rebbî hêvî rica Eskerî

Bide xatirê ehlê beyta kubar

**Ji Şêx Hesîb**
Peyrewê Rûhî me ender menhec û resm û terîq

Sed hezaran sed hezar car le'neta Heq ser Yezîd

Serxweş e Hesbî yû sermest e qelem der guftugo

Werne der dîwan netîna ismê wî kelbê pelîd

**Neqşebendîtî**

Temayeke bingehîn a ku Rûhî di helbestên xwe de bi kar aniye Neqşebendîtî ye. Neqşebendîtî terîqeteke tesewifî ye û bi taybetî di du sedsalên dawî de bi riya Mewlana Xalidê Şarezorî (k.d.1826) li Kurdistanê gelekî belav bûye. Hem helbestvanê me, hem jî berî wî bavê wî Şêx Hesenê Nûranî nûnerên vê terîqetê ne û li Aqtepeyê postnişînî kirine. Di vê çarçoveyê de Rûhî di berhemên xwe de cih daye vê temayê jî. Rûhî di destpêka Rewdu'n-Ne'îmê de ev yek bi zelalî îfade kiriye:

Li ser î'tîqada Îmam Eş'erî

Terîqet bizan Neqşiyê Xalidî

Kemerbendê seccadeê Neqşiyan

Ji xizmetguzaranê wan ewliyan

Herweha di dîwana xwe de li ser Şahê Neqşebend du medhiye nivîsîne ku bi qasî ku tê dîtin di edebiyata Kurdiya Kurmancî de nimûneyên vê yekê berî Rûhî nehatine dayîn. Li jêrê bendên van helbestan ê ewil hatine dayîn:

Peyrewê dermandeem rû ber hudayê Neqşîbend

Dest(i) der damanê pakê bê riyayê Neqşîbend

Şehriyar im zankî ustad em gedayê Neqşîbend

Tûtiyayê dîdesaz im xakêpayê Neqşîbend

Tabiya bim sirrê Heq ez feyzê Şahê Neqşîbend

---

Kelbê şahê Neqşibend im ta li dinya zinde me

Me'dena cûd û sexaê ez feqîr im hewce me

Der sulûkê rahê Heq ez murxekî perbeste me

Bêhişa xemra gunah im asî û şermende me

el-Eman şahê mezin yexsîrê zincîra te me

Sed meded pîrê terîqet kelbê dergahê te me

Rûhî di mijara Neqşebendîtiyê de bandor li Xakî, Kerbelaî û Eskerî kiriye ku her du jî ji malbata wî ne.

Li ser Neqşebendîtiyê murebbayeke Kerbelayî heye ku neqerata wê weha ye:

Ey qafîle salarê terîqet mededê kon

Gom kerde rehim peyrewê bangê ceres im men

Şêx Eskerî helbesteke Mewlana Xalidê Şarezorî ku derheqê silsileya Neqşebediyan de hatiye nivîsîn, di Keşkûla xwe de bi cih kiriye û wî bi xwe jî li dawiya vê helbestê sê beyt zêde kirine. Şêx Eskerî di van beytan de ji Mewlana Xalid heta bi apê xwe Şêx Mihemed Can cih daye navên şêxên silsileya Neqşebendîtiya Xalidî ku ew jî ev in: Şêx Xalidê Cizîrî, Şêx Salihê Sîpkî, Şêx Hesenê Nûranî û Şêx Mihemed Can.

Şêx Eskerî di medhiyeya Leyla û Mecnûna Şêx Mihemed Can de jî ew wekî pîrê terîqê bi nav kiriye:

Ew pîrê terîqê Şêx Mihemed

Can e Xudê lê ke rehmê bê hed

Şêx Eskerî di mersiyeya xwe ya li ser Şêx Mihemed Can de jî weha behsa Neqşebendîtiyê kiriye:

Tûtiyayê dîde min xakê derê şahê mezin

Neqşibendê qelb û dil ew bo gunahan mehderim

**Xwarin**

Di dawiya sedsala XIXem de li Aqtepe û Hênê di çarçoveya nivîsîna helbestên bi temaya xwarinê de bizaveke edebî derketiye meydanê. Kurên Şêx Hesenê Nûranî Şêx Ebdurehamanê Rûhî û Şêx Mihemed Canê Rûhî (k.d. 1909) li Aqtepeyê û Şêx Muhyedîn jî li Hênê di vê mijarê de helbest nivîsîne. Ji aliyê mehsûlên vê temayê ve Sa'î û Xakî ji Rûhî girîngtir in. Lewra ji Sa'î berhemeke serbixwe, ji Xakî helbesteke serbîxwe, lê ji Rûhî tenê beytek gihîştiye destê me. Lêbelê

tişta ku tê fêmkirin Rûhî di vî warî de berî wan e. Lewra Şêx Mihemed Can di helbesta xwe ya derheqê xwarinê de beyteke Rûhî iqtîbas kiriye:

Le tu naki behse tirşa bamiya

Texi nav cend parce goşte hindiya

Laiq e ew bete sufra waliya

Şexe cumle tirşika sahib huner

Di benda joîrn ya Şêx Mihemed Can de her du misrayên pêşî yên Rûhî in. Ji ber ku Rûhî birayê mezin ê Şêx Mihemed Can e tê fêmkirin ku ku wî berî Şêx Mihemed Can ev beyt nivîsiye. Bi awayekî mentiqî li gorî ku Şêx Mihemed Can beyteke birayê xwe yê mezin xistiye nav helbesta xwe, pêwîst e ku Rûhî ev beyta xwe berî wî nivîsîbe. Ne îhtîmaleke dûr e ku ev beyt parçeyek ji helbesteke serbixwe ya Rûhî a derheqê xwarinê de be.[3] Ev jî nîşan dide ku di temaya xwarinê de yek ji jêderên Şêx Mihemed Can Rûhî ye. Heçî Sa'î ye, em wek Şêx Mihemed Can bi hêsanî nikarin bibêjin ew jî di bin bandora Rûhî de maye. lewra ew û Rûhî hevalên hev in û bi em bi teqezî nikarin bibêjin kî ji kê mezintir e. Lêbelê ji hêza edebî ya Rûhî û bandora wî em dikarin texmîn bikin Rûhî di warê temaya xwarinê de jî berî Sa'î ye.

### Muxennîname

Dahênaneke dî ya Rûhî muxennînameya wî ye. Wek têgeheke edebî muxennîname cureyeke helbestê ye ku bi teşeya mesnewiyê û ji behra muteqaribê bi qalibê "fe'ûlun fe'ûlun fe'ûlun fe'ûl" tê nivîsîn û tê de xîtabî muxennî tê kirin. Çawa ku bi awayekî serbixwe jî hatine nivîsîn, di nav saqînameyan de jî hatine nivîsîn.[4] Bi qasî ku tê dîtin di edebiyata Kurdiya Kurmancî de berî wî muxennîname nehatine nivîsîn. Rûhî di cureya muxennnameyê de bandor li helbestvanekî malbata xwe kiriye ku ew jî Şex Mihmed Eskerî kiriye.

[3] Ev helbest di dawiya dîwana Şêx Hesîb a destxet de cih digire û di sala 1943yan de ji aliyê Şêx Eskerî ve hatiye îstinsaxkirin. (*Dîwan Hesbî*, nusxeya destxet, pirtûkxaneya taybet a Abdurrahman Adak, r. 111-113).

[4] Mensûr Restgar Fesaî, *Enwa'ê Şi'rê Farisî*, Şîraz 1373, r. 19-22; Tahir-ül Mevlevî, *Edebiyat Lügatı*, Enderun Kitabevi, İstanbul 1994, r. 304-307.

## Bandora Rûhî di Huner û Şêwazê de

### Tekrîr

Wek têgeheke belaxetê eger di nav metnekî edebî (misra, beyt yan bendek), yan jî gotarekê de de peyv, yan komepeyvek çendîn caran li pey hev bê dubarekirin ew hunera tekrîrê ye. Rûhî di helbestên xwe de girîngiyeke mezin daye aheng û melodiyê. Wî di vê çarçoveyê de di gelek helbestan de neqerat bi kar anîne cih daye hunera tekrîrê. Ev jî wek taybetiyeke ciyaker a Rûhî derdikeve meydanê. Li jêrê ji helbestên Rûhî çend nimûne hatine dayîn:

Lebgul û gerdengul û xebxebgul û ruxsar e gul

Dêmgul û çehregul û tengul seraser yar e gul

Qedgul û qametgul û xeddê munewwer gulgulî

Cebhetê beyda gul e **gulturreya** turrar e gul

Xalîba **Rûhî** muşerref bû bi wesla gulruxan

Lew xezel gul gul dibêjit serteser tekrar e gul

Bê tebîb im bê tebîb im bê tebîb im bê tebîb

Bê nesîb im bê nesîb im bê nesîb im bê nesîb

Ez xerîb im ez xerîb im ez xerîb im ez xerîb

Endelîb im  endelîb im endelîb im endelîb

Bi qurban bim bi qurban bim bi qurban

Felek hey, felek hey, felek hey, felek!

Qelem ey qelem ey qelem ey qelem

Huseyna  Huseyna Huseyna Huseyn

Rûhî di hunera tekrîrê de bandor li helbestvanekî malbata xwe kiriye ku ew jî Kerbelaî ye. Di nimûneyên jêrîn ên Kerbelaî de ev yek bi zelalî dikare bê dîtin.

**Kerbelaî**

Mujde ey dil dil di ber gul barê der gul yar tê

Bisk û kakul zulf û sunbul helqeê gulnar tê

Min roj e şev şev e şev şev her şev e şev e şev

Zêde ji şêv û rojan ev der şev e şev e şev

Rûhiy û tu reyhani yû rehrahi yû rah î

Rehmê bi gedayê xwe ke ey rûhî fidayet

**Qelem**

Yek ji dahênanên Rûhî ew e ku wî têgeha qelemê kiriye hêmaneke sereke ya Rewdu'n-Ne'îma xwe. Bêguman berî Rûhî Xanî ev têgeh bi kar aniye, lêbelê Rûhî ev yek gelekî pêş xistiye. Li jêrê ji van bikaranînên Rûhî çend nimûne hatine dayîn:

Qelem hate cûnbiş bi 'işqa giran

Bi ferqê serê xwe di emrê'm rewan

Qelem ey qelem ey qelem ey qelem

Bizane di dil de mi zehf in elem

Me anî qelem kir serê xameê

Ku cunbuş bidim vê siyeh cameê

Rûhî di vê dahênanê de bandor li Mela Eliyê Baqustanî kiriye. li jêrê ji helbestên Baqustanî çend nimûne hatine dayîn.[5]

Ker û lal û gêj im ji min nîn medar

Bi xeyrê kelîma şehadet qerar

[5] Bnr. Zahir Ertekin, Mela Ebdulfettahê Hezroyî (Fethî) û *Qesîdet'ul Qelem*a Wî (Metn-Lêkolîn), Nûbihar Akademî, j. 6

Qelem ey qelem ey qelem ey qelem

Kerem ke qiyam ke eya muhterem

**Navê Berhemê**

Mela Yasîn Yusrî (1994) bi navê Rewdu-l Heyatê berhemek nivîsiye. Mela Yasîn xelkê herêma Diyarbekirê ye û bi malbata Aqtepeyê re di nav têkiliyan de bûye. Loma bi awayekî siruştî ew jî di nav hînterlanda bandora Rûhî de mezin bûye. Bi qeneeta me di binavkirina berhema xwe Rewdu-l Heyatê de ew di bin bandora navê Rewdu'n-Ne'îma Rûhî de maye. Loma di her du nav heman wateyê îfade dikin û ew jî baxçeyekî xweş e.

**Hin Nîşaneyên dî yên Bandora Aqtepî**

**Nezîre**

Nezîre, ji wê helbesta ku ji aliyê helbestvanê xwe ve, bi rêbaza modelwergirtinê bi heman teşe, kêş, serwa, paşserwa, tema û îfadeyan ve li ber helbesta hebestvanekî dî hatibe nivîsandin re tê gotin. Ji ber ku di helbesta klasîk de nerîteke edebî heye, helbesetvanê nû di nav wê nerîtê de bi helbestên helbestvanê kevin perwerde dibin û dawiyê ew jî dikevin nav nerîtê. Loma gelek caran helbestvanan di nivîsîna helbestan de helbestên ku ecibandine ji xwe re kirine model û li ber wan helbest nivîsîne. Bi vî awayî xwestine rêza xwe ji wan re nîşan bidin û payeya wan bilind bikin. Carinan jî xwestine bi nivîsîna helbesteke xweştir bidin pêşiya helbestvanê bingehîn. Helbestvanên ku nû dest bi nivîsîna helbestê kirine jî bi rêya nezîreyê xwe perwerde kirine û ew teqlîd kirine.[6] Di vê çarçoveyê de em dibînin ku Kerbelaî û 'Eskerî li ser beyteke Rûhî nezîreyeke hevpar nivîsîne. Kerbelaî û 'Eskerî ev beyta bavê xwe gelekî ecibandine û di dirûvê wê de helbestek nivîsîne. Bêguman ev jî nîşaneyeka bandora Rûhî ye. Di helbestê de beyta yekem a Rûhî ye, peyre bi dorê beytek ji Kerbelaî û yek ji Eskerî hatiye.:

Du ta sosin du ta ceh min girêdabû di nav hev de

Eger çarê dî jî hebwa bi tehqîq ew dibû qevde

6 Ji bo nezîreyê bnr. İsmail Durmuş, M. Fatih Köksal, Mustafa Çiçekler, "Nazîre", *DİA*, İst. 2006, b. 32, r. 455-458.; Saraç, Klasik Edebiyat Bilgisi Belagat, Gökkubbe, İst. 2014, r. 272.

Heme alem lebaleb sosin û nesrîn û gulnar in

Ne ku sosin tune ya ceh welê kes nîne ber hev de

..

Bibêje **Kerbelayî** van cuwanterhan ji kû tînî

Eger ne xaliqê purqudretê ruhperwer ew av de

Eger ne **Eskerî** şewqa gul û reyhanê dilber bit

Ki yê ceh gendim û sosin weha hinde ku tev hev de

**Teqrîz**

Ew metnên ku derheqê pesnê berhemekê de hatine nivîsîn wek teqrîz tên binavkirin. Şêx Mihemed Can ji bo Rewdu'n-Ne'îma birayê xwe yê mezin Rûhî teqrîzek nivîsiye û Rûhî ew teqrîza wî xistiya dawiya Rewdu'n-Ne'îmê û gotiye ku yê ku daxwaza nivîsîna Rewdu'n-Ne'îmê ji min kiriye Mihemed Can e. Bêguman ev jî bandora Rûhî li ser Şêx Mihemed Can nîşaneyeke girîng e. Li jêrê ji vê teqrîzê çend beyt cih digirin:

Bismillahirrehmanirrehîm

Hemdê bêhed bo xudawendê kerîm

…

Nezm(i) kirye Şemsedînê Rûhî

Der şemaîl û di mi'racê nebî

Daniye ismê ewê Rewdu'n-Ne'îm

Ev hediyye daye wî Rebbê Kerîm

Ger bibêjim wesfê nazim Şemsedîn

Qet nehin şibhê wî der rûyê zemîn

...

Tu Muhemmed Can 'efû kî ey Xuda

Ez hebîbê xwe meke **Xakî** cuda

**Xakiya** tarîxê nezmê mu'teber

Hate der cewher ji deryaê huner (1302)

**Medhiye**

Di edebiyata klasîk de helbestên ku derheqê pesnê kesayetekî girîng de hatine nivîsîn wek medhiye tên binavkirin. Xemkûrê Xursî jî li ser Rûhî medhiyeyek nivîsiye. Bêguman ev jî ji bo bandora Rûhî li ser Xemkûrê Xursî nîşaneyeke girîng e.

**Çavkanî**

Fesaî, Mensûr Restgar, Enwa'ê Şi'rê Farisî, Şîraz 1373, r. 19-22; Tahir-ül Mevlevî, Edebiyat Lügatı, Enderun Kitabevi, İstanbul 1994.

Korkusuz, M.Şefik, Tezkire-i Meşayih-i Amid, c.I-II, Kent Yayınları, İstanbul, 2004

Özaydın, Murat, Şeyh Abdurrahman Aktepe: Hayatı, Eserleri ve Görüşleri, Cihan Yayınları, İstanbul 2009.

Hesbî, Dîwan Hesbî, nusxeya destxet, pirtûkxaneya taybet a Abdurrahman Adak.

Ertekin, Zahir, Mela Ebdulfettahê Hezroyî (Fethî) û Qesîdet'ul Qelema Wî (Metn-Lêkolîn), Nûbihar Akademî, j. 6.

Durmuş, İsmail, (M. Fatih Köksal, Mustafa Çiçekler), "Nazîre", DİA, İst. 2006, b. 32.

Saraç, Klasik Edebiyat Bilgisi Belagat, Gökkubbe, İst. 2014.